–أنا جلال ابن الشيخ حسام الدين الشيخ نوري، ابن الشيخ غفور الطالباني، ولدت في قرية كلكان التابعة لقضاء كويسنجق، لست متأكدا من تاريخ ولادتي، ولكني حاولت قبل وفاة أمي أن أسألها عن تاريخ ولادتي، ولأنها أمية فكل ما تذكرته أنني ولدت بفصل الصيف، وفق قولها كان ذلك بعام ظهور الفلس العراقي، وهذا يعني بأنني ولدت عام ١٩٣٣أو١٩٣٤ على أبعد تقدير.ولكني أرجح تاريخ ١٩٣٣، لأني أتذكر أنه كان يحق لي دخول المدرسة قبل سنة من السن القانونية المحددة بسبع سنوات، ولذلك أنا متيقن بأنني من مواليد ١٩٣٣ على الرغم من أن وثائقي الرسمية دون فيها تاريخ ١٩٣٤ للولادة.

***إذن بداية الدراسة ومرحلة المراهقة أين قضيتهما؟**

–بقينا سنوات عدة في قرية كلكان، ثم توفي أحد أعمام والدي وكان شيخا يدير أمور التكية الطالبانية في قضاء كويسنجق، وقد حل أبي مكانه وأصبح مرشدا للتكية، ولذلك إنتقلنا الى كويسنجق، لا أتذكر التاريخ بالضبط، ولكن بإنتقالنا من القرية الى المدينة شعرت بتغير أحوالنا وطريقة معيشتنا بشكل كبير. فكانت للتكية ساحة كبيرة وواسعة يكسوها الأخضر والأشجار حولها، وكانت أصوات الآذان والصلوات الخمس وتلاوات القرآن واذكار وتسابيح الدراويش تجعلنا نعيش في أجواء دينية خالصة. وأتذكر أنني كنت أرتاد تلك الحلقات وأشارك الدرويش بأذكارهم وأقلد حركاتهم..كما أتذكر بأنني قبل إدخالي الى المدرسة وضعوني في (الكتاب) لتحفيظي القرآن كعادة ذلك الزمان. وكان أحد أبناء عمومتي يدعى كاكةسور يلقننا أشعار الشاعر الشيخ رضا الطالباني، خاصة أشعاره في مديح الشيوخ الطالبانية.

مازلت أتذكر حدثين مهمين وقعا في عام ١٩٤١ وهما، حركة رشيد عالي الكيلاني ومعاركه مع الإنجليز، والثاني الحرب التي إندلعت بين الألمان والسوفييت بعد إحتلال الأراضي السوفيتية. وسبب تعلق هذه الأحداث بذاكرتي يعود الى أننا كنا واحدا من العوائل القليلة التي تمتلك الراديو في كويسنجق، وكنا نتلقى أخبار العالم منه، ومن خلال الراديو عرفنا بمحاصرة قوات الإنجليز من قبل الجيش العراقي في الحبانية، ثم قضاء الإنجليز على تمرد رشيد عالي وكسر الحصار، وتأكد إنتصار الإنجليز لنا حين وصلوا بمجموعات الى كويسنجق، وعادت صالات السينما لعرض دعاياتها لصالح الإنجليز.

أما الحدث الثاني فمازلت أتذكر جيدا هجوم الألمان على الإتحاد السوفيتي، لأنه في ذلك الوقت كان وكيل قائممقام كويسنجق الشيخ فاضل طالباني والد الأخ خسرو، وبصفتي الإبن البكر لوالدي فقد كان يسمح لي بحضور مجلسه، وهناك كنت أسمع مرارا بأن الألمان سوف ينهزمون بالحرب بسبب جرأتهم للإعتداء على الإتحاد السوفيتي، وقبلها كان الجميع متفقين على إنتصار ألمانيا في الحرب العالمية الثانية. لكن الشيخ فاضل كان على يقين بإندحار الألمان، ويردد أمامنا بأن نابليون بونابرت حاول بدوره إحتلال روسيا لكنه أخفق وقبل وصوله الى موسكو تم إيقاف زحفه، وفي تلك المرحلة من الطفولة تعرفت على أسماء بعض القادة مثل ستالين ونابليون وهتلر الذين تأثرت بهم. وخصوصا الحرب الدائرة بين ستالين وهتلر والتي أشغلتني و زرعت البذرات الأولى بنفسي لجهة الإهتمام بالعمل السياسي والفكري..

بعد شهر واحد من تلك الأحداث دخلت المدرسة، وهناك إلتقيت بمعلمين كان معظمهم كردا، يحفظوننا الأشعار الكردية ويعلموننا الأناشيد التي تحرك فينا المشاعر القومية. هذه الأحداث برمتها عجلت دخولي الى معترك النضال القومي.وأتذكر أنني كنت في الصف الرابع الإبتدائي حين جرت مراسيم إحياء عيد نوروز في كويسنجق، وكنت أحد الأطفال الذين ألقوا القصائد بالمناسبة، حيث كنت من الطلبة القلائل الذين يلقون القصائد أثناء وقوف الطلاب في الصفوف الصباحية، وكنت أقرأ قصائد الشاعر الكبير الحاج قادر كويي وأشعار الملا محمد الكبير وخاصة القومية والوطنية التي تنشرها صحيفة كلاويز في تلك الفترة.



أما الأساتذة الذين كانوا يدرسوننا فقد تأثرت بعدد قليل منهم وهم الذين وضعوا الأساس الفكري والأخلاقي لعملي السياسي اللاحق، ومنهم معلم التاريخ الاستاذ المرحوم مجيد شيخ نوري، والأستاذ محمد أمين معروف الذي كان أكثرهم تأثيرا علي، فقد كان أحد المعلمين الأذكياء، كنا على العموم مأخوذين بأخلاقياتهم العالية وحسن تعاملهم معنا مما ترك فينا أثرا كبيرا.

وأتذكر أيضا بأنني عندما وصلت الصف الخامس الإبتدائي، كنت قد بدأت أدس أنفي بالسياسة حيث كانت مسألة جمهورية مهاباد تتصدر الأحداث في تلك الحقبة، لم تكن الجمهورية قد تشكلت بعد، ولكننا كنا نسمع بإسم مهاباد يتردد على الألسن، الى جانب الأخبار المتعلقة بإنتفاضة البارزانيين والتي كانت تملأ الصحف الوطنية وتذاع أخبارها في القسم الكردي من راديو تبريز، كل هذه الأحداث شكلت الخميرة الأولى لأفكاري السياسية، الى جانب متابعاتي لما ينشر في مجلة "الوطن" لسان حال جمعية "ز.ك"، أضف الى كل ذلك الحديث الدائر في بيتنا، حيث كان الجميع يتحدثون في السياسة، خاصة حين يحل الضيوف على مجلس والدي، من بينهم الحاج باقي الذي كان أحد المثقفين الأجلاء تم القبض عليه فيما بعد بمدينة السليمانية.

***هل تقصد الحاج باقي مدرس الفيزياء الذي ألقي القبض عليه بأحداث عام ١٩٦٣ في السليمانية؟**

–نعم هو ذاك..تم القبض عليه من قبل البعثيين ثم جرى إعدامه..كان أحد جيراننا في كويسنجق، كان عندما يعود في عطلة الصيف يقضي معظم أيامه في بيتنا ويجلس في باحة الدار التي كان هواؤها معتدلا ليحدثنا عن السياسة، كما أنه كان يدرسني دوما دروس العام اللاحق لدراستي، فعندما كنت في الصف الرابع كان يدرسني مناهج الصف الخامس وهكذا..

ولأن الأجواء في بيتنا خيمت عليها السياسة، وكنت محبا للشعر وأحفظ أناشيد المدرسة، لذلك نما عندي شغف بالسياسة، وتحديدا عندما كنت في الصف الخامس الإبتدائي حيث حلت ذكرى نوروز والتي شكلت نقلة مهمة في حياتي السياسية. فقد طلبوا مني أن أكتب مقالة نثرية بهذه المناسبة، فكتبت المقالة وتحدثت فيها عن تخلف الشعب الكردي وتعرضه الدائم للظلم والإضطهاد، وقلت فيه ان جميع الشعوب تتجه نحو الإستقلال والتحرر بما فيهم اليهود الذين يمضون نحو تأسيس كيانهم القومي، والكرد هم الشعب الوحيد الذي لم يحقق لنفسه شيئا، وبعد أن أنهيت قراءة مقالتي إستدعاني أحد المعلمين وقال لي "إن اليهود هم شعب مثلنا فلم وصفتهم بهذا الإحتقار"؟ في الحقيقة لم يكن قصدي التقليل من شأن اليهود أو أن أكون ضد دولتهم، لأن علاقتي بيهود كويسنجق كانت جيدة جدا، وكان في صفي أحد أبناء اليهود لم يصادقه أحد غيري، وقد أثرت صداقته بي كثيرا، وسبب صداقتي له يعود الى حادثة طريفة.فحينما وقعت أحداث رشيد عالي الكيلاني قام عدد من الطلبة بالهجوم على حي اليهود بمدينة كويسنجق، وكانت مدرستنا تقع في ذلك الحي وتسمى مدرسة اليهود، رأيت هناك مجموعة من الطلبة يرشقون بيوت اليهود بالحجارة، وقد أصيب هذا الصديق بحجر في رأسه وكان ينزف دما، لقد إشمأزت من هذا المنظر وإنزعجت كثيرا، لذلك أسرعت بنجدته وساعدني بعض الأشخاص الذين جاءوا لفض المهاجمين، وكان هذا مبتدأ علاقة الصداقة بيننا.

القضية الكردية في الصحافة العالمية

صالح القلاب: هل سيخسر الأكراد القرن الجديد كما خسروا الذي قبله؟

لأن القرن الماضي، القرن العشرين، قد حرم الأكراد من أن يكون لهم كيانهم المستقل وتكون لهم دولة »قطرية «أو »قومية«، مثلهم مثل كل شعوب هذه المنطقة التي كانت منضوية في إطار الخلافة العثمانية، فقد ساد اعتقاد بأن هذه الألفية الثالثة ستنصف هذا الشعب أو هذه الأمة، وأن هذا الاقتتال الذي بقي محتدماً في سوريا وفي العراق وأيضاً إنْ ليس داخل تركيا فعلى أطرافها، سوف يسفر عن اجتراح هذا الشعب لبعض حقوقه وأكثر من مجرد »الحكم الذاتي « الذي يتغنى به أصحاب »سوريا الديمقراطية « بعد تحرير »الباغوز« في شرق الفرات من تنظيم »داعش «الإرهابي.

تشير التقديرات، التي هي أقرب إلى الصحة، إلى أن عدد الأكراد، أو الكرد، في تركيا يتجاوز ثلاثين مليوناً، وأن عددهم في العراق يصل إلى أربعة ملايين أو يتجاوزها بقليل، بينما عددهم في إيران يصل إلى هذا الرقم آنف الذكر نفسه، هذا باستثناء «اللور» و«الفيليين» الشيعة، وذلك في حين أن عددهم في سوريا يصل إلى المليونين وربما أكثر قليلاً، وأن لهم وجوداً في الأردن وفي بعض دول الخليج العربي وأيضاً في أذربيجان وأرمينيا وروسيا وفي بعض الدول الأوروبية الشرقية والغربية.

كان الأكراد قد »ضاعوا «في إطار الإمبراطورية العثمانية كما »ضاع «غيرهم، ومنهم عرب بلاد الشام وبلاد الرافدين تحديداً، ولكنهم بعد غروب شمس العثمانيين كنتيجة للحرب العالمية الأولى تحولوا إلى فَرْقِ حسابات بين الدول الناشئة ومن بينها تركيا، التي أصبح عددهم فيها بعد نحو قرن بأكمله يزيد على ثلاثين مليوناً، والعراق وسوريا، وذلك في حين أنه كان لإيران الشاهنشاهية حصتها من هذا التقاسم بعدد يقال إنه بعد كل هذه الفترة الطويلة قد وصل إلى خمسة ملايين والبعض يقول لا بل إنه بالإضافة إلى »اللور «و»الفيليين « و»البلوش «قد تجاوز عشرة ملايين!

والمعروف أنَّ النزعة الاستقلالية لدى قاضي محمد، من أكراد إيران، ولدى الملا مصطفى البارزاني، من أكراد شمال شرقي العراق، قد أدت في ٢٢ يناير (كانون الثاني) عام ١٩٤٦ إلى إنشاء »جمهورية مهاباد «المعروفة بمساندة ودعم الرئيس السوفياتي الأسبق جوزيف ستالين الذي كان يسعى لتوسيع نفوذ الدولة السوفياتية بإقامة كيانات قومية تابعة لموسكو وموالية له وللحزب الشيوعي، لكن هذه الدويلة الكردية لم تعش إلا أحد عشر شهراً وكانت نهايتها المأساوية قد تمت بضغط شاه إيران رضا بهلوي وبمساندة أميركا التي قامت بدورها بضغط شديد على الدولة السوفياتية وحمْلِها على رفع يدها عن هذه الدويلة.

وكانت النتيجة أن إيران الشاهنشاهية بعد أن أسقطت هذه الجمهورية، جمهورية مهاباد، قد بادرت في عام ١٩٤٧ إلى إعدام قاضي محمد، في حين أن القائد الفعلي لهذه الدولة القصيرة العمر الملا مصطفى البارزاني، قد لجأ مع بعض ضباطه إلى الاتحاد السوفياتي وبقي هناك لفترة طويلة، حيث عاد بعد ذلك إلى كردستان العراقية ليبدأ ثورة مسلحة استمرت لسنوات طويلة وانتهت بلعبة »تآمرية «بين الشاه محمد رضا بهلوي والرئيس العراقي صدام حسين وبوساطة دولية عربية أفريقية!

ولعل ما تجدر الإشارة إليه هنا هو أن النزعة الاستقلالية لدى أكراد إيران قد تواصلت هي بدورها وعلى غرار ما بقي يجري في كردستان العراق. لقد شهد عام ١٩٦٧ ثورة كردية بقيادة الزعيم الكردي الإيراني عبد الرحمن قاسملو الذي تم اغتياله لاحقاً في عام ١٩٨٩ في فيينا بعد قيادته تمرداً جديداً في سنندج في كردستان الإيرانية في عام ١٩٧٩. بعد الثورة الخمينية مباشرةً، تم قمعه بقسوة دموية مرعبة، حيث تم إعدام بعض الثوار الأكراد في كرمنشاه على أعمدة الكهرباء.

ثم وغير محاولة »مهاباد «هذه ومحاولات عبد الرحمن قاسملو في سنندج وكرمنشاه، فقد كانت هناك محاولات أخرى متواضعة وعابرة في هذا المجال، سابقة ولاحقة، من بينها تلك التي تمت في عام ١٩٢٣ في عهد لينين في بداية صعود الدولة السوفياتية والتي انتهت في عام ١٩٢٩ وكانت قد أُعطيت اسم جمهورية كردستان الحمراء وكانت تابعة عملياً لحكومة أذربيجان الشيوعية، هذا بالإضافة إلى المحاولة التي كانت قد جرت مؤخراً، أي في عام ١٩٩٢، بقيادة وكيل مصطفاييف في ناغورنو قرباغ التي ضمّتها أرمينيا إليها فكانت هذه نهاية لتلك المحاولة الفاشلة التي لم تتبعها أي محاولة أخرى منذ ذلك الحين حتى الآن.

إنه لا شك في أن الأكراد، أكراد العراق وأكراد إيران تحديداً، بقوا يحاولون إقامة دولتهم الوطنية المستقلة كخطوة لإقامة الدولة الكردية القومية المنشودة، لكنّ كل محاولاتهم هذه قد باءت بالفشل لأن دول هذه المنطقة المعنية كلها بقيت تقاوم وترفض حقَّ تقرير المصير لـ»أكرادها «ولأكراد غيرها، والمعروف أن تركيا كانت ولا تزال الأكثر تشدداً في هذا المجال وإلى حدّ أنها بقيت وإلى فترة لاحقة قريبة ترفض الاعتراف بوجود كُرْدٍ عندها وعلى اعتبار أن هؤلاء هم أتراك الجبال!

وهنا وللإنصاف فإن العراق وحده الذي كان قد اعترف ومبكراً بأن هناك شعباً كردياً عراقياً إنْ في الشمال العراقي وإنْ في بغداد نفسها، لكن ومع ذلك فإنه لا يزال هناك رفض لحق تقرير المصير للأكراد العراقيين، وهكذا فإن البديل المعترف به الآن هو الحكم الذاتي الذي يلامس مواصفات الدولة المستقلة. وعليه ومع أن هذه المنطقة، بعد كل هذه التمزقات التي شهدتها والتي لا تزال تشهدها، باتت بحاجة بالنسبة إلى بعض دولها لإعادة صياغة جديدة غير صياغة »سايكس – بيكو «التي حرمت الأكراد مما حصل عليه غيرهم، أتراكاً وعرباً وإيرانيين وآذاريين وأرمنيين، مما يتطلب في ظل كل هذه التحولات التي تشهدها هذه المنطقة، التساؤل: »الأكراد إلى أين... وما مصيرهم؟!.«

إن تركيا، التي هي المعنيّ الأول بهذه المسألة نظراً إلى أن عدد »أكرادها «قد تجاوز ثلاثين مليوناً، قد حالت دون انضمام أكراد سوريا إلى مساعي حل الأزمة السورية، إنْ في جنيف وإنْ في سوتشي وأيضاً إنْ في »آستانة«، تحاشياً لنيلهم أي حقوق ديمقراطية في بلدهم سوريا، خوفاً من أن تنتقل العدوى بالنسبة إلى هذا الأمر إليها وبخاصة أنها لا تزال تعاني من بروز حزب العمال الكردستاني – التركي P K K»« الذي تعتبر حكومة رجب طيب إردوغان أن »حزب العمال الديمقراطي في سوريا «بقيادة صالح مسلم يشكل امتداداً له.

وهنا فإن الواضح أن رجب طيب إردوغان قد استطاع استقطاب أكراد تركيا بمعظمهم من خلال توجهه الإسلامي، وأنه تمكّن من استيعاب هؤلاء في تنظيم »الإخوان المسلمين« وفي توجهاته الإسلامية مما يعني أن حق تقرير المصير بالنسبة إلى هؤلاء الكرد لا يزال بعيد المنال، وبالتالي فإنه غير مستبعد أن يخسر الكرد كلهم هذا القرن كما خسروا القرن السابق، وهكذا وفي النهاية فإن مما يزيد على مصائب هذا الشعب الطيب مصيبة جديدة أنه قد وصلت إلى دراسة عنوانها »هل الأكراد يمنيون قدماء؟«، وهنا ويقيناً يجب ترك اليمنيين لهمومهم الشائكة الكثيرة وترك الكرد ليحفروا في الصوان ليحصلوا ولو على القليل من حقوقهم المشروعة.

تابعوا جريدة التقدمي فهي تعبر عن تطلعاتكم القومية

Konê Reş Di 119 Saliya Rojbûna Apo Osman Sebrî de helbestek Cegerxwîn



Bi helkeftina ku di roja 5.1.2024an de, 119 sal di ser rojbûna lehengê Kurd Apo Osman Sebrî re derbas dibe, bi min xweş e ku, ez wî bi van gotinan û vê helbesta ku seydayê Cegerxwîn di pesnê wî de gotiye, bibîr bînim.. Ew ne yê jibîrkirinê ye..

Gelo! Osman Sebrî kî bû ta ku ez wî wek lehengekî ji lehengên gelê kurd dibînim? Ew navekî sereke û belû ye di nav tevgera rizgarîxwazî gelê Kurd de li Suriyê û di tevayî Kurdistanê de. Mirovekî Kurd bû û di tevayî Kurdistanê de wek; têkoşerekî, torevanekî û rewşenbîrekî hatiye naskirin. Ji mafê wî û zarokên me ye ku em wî bi bîr bînin, da ku nifşên nû ji nêzîk ve wî nas bikin.

Vî lehengî bi tev şiyanên xwe bervedêrî di ber mafê gelê Kurdistanê de kiriye... Ji destpêka xortaniya xwe ve û ta rojên xwe yên dawî. Anku di 88 buharên xwe de, bi vîneke ku nayê tewandin li ber xwe daye û ranewestiya ye.. Ew jî li ser vê rêbazê, gelek caran ji rex dagirkerên Kurdistanê ve hatiye girtin û surgûnkirin û tev jiyana xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kiriye.

Herwiha wî li dor hezkirina Zimanê Kurdî wiha gotiye: (Ev ji bextê me yê reş e. Bav û kalên me gunehkariyeke mezin kirine ku bi zimanê xwe mijûl nebûne. Di welatê me de Ermenî hebûn, Sûryanî hebûn, hindik bûn, lê wan bi zimanê xwe dixwendin. Me diçû bi zimanê Tirkan û Ereban dixwend. Ev hemî sûcê bav û kalên me ne, em hîn nekiribûn. Heye ku rehmetî Celadet nebiwa, dibû ku me bi xwe jî guh nedabiwa vî karê ha. Ji ber ku em ne xwediyê vê fikrê bûn, ev fikir ji wî derket, mala wî hezar carî ava..). Seydayê Cegerxwîn jî, ev helbesta xwarê bi navê (Ji Osman Sebrî Efendî Re) pesnê wî daye:

Bigorî bim ji bo te ey birayê min tu kanî
Ji dûrî ve te destê xwe di nîv destê min danî
Bi min û te du destên bê çep û rast ey birader
Belê herdu qewî jarin di yek laşê giranî
Me pirsî derdê Kurdmancan ji çerxa etlesa jor
Nezanî bo tevan derde belê lê me xizanî
Belê zêre belê zêre belê zêre belê zêr
Xwedanê wî cîhangêre bela ker bit dixanî
Ji bo me ne eqil fêde dikî ne xwendina pir
Ji bo me ço divêtin da ji tirsan bidne banî
Feke va ye mirim îro ji dinya ez hilat im
Bi gera xwe bi çerxa xwe te daxwaza me nanî
Cegerxwîn im mirim ez çûm ji bo we Sebriyek ma
Erê himberî Kurde welê bê wehya esmanî.

Helbest: Cegerxwîn

Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

Parçeyek ji bersiva Hoşeng

Xwendevanên hêja
Di vê hejmarê de emê parçeyekê ji bersiva Hoşeng diyarî we bikin , Apê Osman Dema kurê wî Hoşeng nameyekê jê re dişîne û amaje dide gotinên xelkê ku Xwedêgiravî bavê wî ji xebatê sar û bêhêvî bûye, kela dilê Osman Sebrî gurr dibe û ji ber derew û neheqiya xirabkaran Apê me wiha Bersiva Hoşeng dide:

"Delal: Gava em ne çak û dirust bin. Tekez ew ji pîsî û neqenciya me ye. Em çawa dikarin bêjin "Sûcê felek û koledar tê heye?"
Ma heya çi gavê em dê ji sûc û gunehên xwe birevin?
Riya rast berdin, bikevin xaçerêyan, deverû bikevin.
Riya rast şemirandin ne karê camêran e; tekez qelsî ye.
Ji gunehên xwe revîn karê nemerdan e, bes pîsî ye. Ji bo çi holê em pîsiyê di xwe de tînin?
Neyar û nemerdan dilgeş dikin, bi xwe dikenînin.
Ev yek bûye nexweşiyek malkambax ketiye canê me.
Wey xwelî li serê me, me riya rast şemirand.
Gelo! Ma em dê çawa xwe ji vê nexweşiyê xilas kin?
Gunehên xwe bibînin, qencî û neqenciyê ji hev nas kin?
Guh bide min, delal!
Ez sond dixwim bi serê te û Hoşîn û Heval.
Ku tu caran ji xwe û gel bêhêvî nebûme.
Li ser şopa qelsan nehatime û tê neçûme. Ji lew re diviyabû ji her kirê hûr bim.
Xwe ragirim, ji her kesî dûr bim.
Heya rastî ji her kesî ve xuya be.
Qencî û neqencî ji hev cuda be."

(Osman Sebrî 1977)

Desteya Sernivîser a Pêşverû

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola kovara (Ronahî) di pêşketina çand û çapemeniya Kurdî de

Herdîsan jî di vir de li ser rewşa jiyana rojane û kêmxwarin û nanên rojane li nik Almanan hatine xûyakirin,ji ber ku gelên derdorê nedixwastin alîkariyê bidin leşgerên Almanan,lê şêniyên navçeyên Sovyetî digotin:Emê bi zadê xwe zarokên xwe xwedî bikin û emê ne xelkê dijmin xwedî bikin.
Celadet dibêje:Di vê rewşê de,rewşa Romaniya ji hemû dewletan xeraptir e û ta niha zirar û ziyana wan ji kuştî,birîndar,windabûnê gihaye 500 000. mêr, ew hîn dinvîse: Bi kurtasî; eger miletên Ewropî dost bin yan dijmin bin,ew hemû ji rêberê Gêrmanistanê Hitlêr têşin û bi vî awayî armanac; ne tenê neyarên Hitlir bû,lê belê Hitlir yar û hevalbendên xwe jî dixeyidandin,li dawiyê:C.Bedirxan dibêje:Herçendî şer dom dike,dêmokrasî xurt dibe).
Dîsan sernivîser gotarekê bi navnîşana (Di gundekî Stalîngradê de) dinivîse:Şerê Stalîngradê çend rojên dom dike, lê Rusan mêrantîyek ecêb
Şanî daye û C .Bedirxan li ser zimanê rojnamevanekî Rus Alekî Marlov dinivîse:Em di berbangê de gihane gundekî li derdora Stalîngradê,ew gunda vala bû,lê li ser berfê şopine piyan xûya dikirin,lewra jî berpirsiyarekî gotibû , gelek diyar e ku dijmin hin caran dikeve vî gundî, lewra jî; divê em li vir xwe veşêrin û li dijmin bipên,lê leşgerên Almanî hatin û ketin vî gundî, lê Alman di deriyên malan re ketin hundir malan, lê ew di rodankên van malan re jî direvîn ,lê wan hemû hundirên malan lexem jî kiribûn taku leşgerên me vegerin malên xwe û ew di hundiran de bimirin,lê leşgerên me kanîbûn leşgerên Alman di wan hundiran de jî bikujin . Hejmar (10).
Herdîsan Silêman Ferho gotarek dirêj di bin navnîşana(Ji Honkong heta bi Nûyorkê) diweşîne;ew di vir de dibêje:Honkong li Rohilatê Çînê giravek e,ewa wargehek e Îngilîzî ye,par Japanan Honkong vegirt û Emêrkaniyek bi navê Jan Henrîk Marsaman hebû û ew hate girtin .
Marsaman xwe ji nav lepên Japanan rizgar kir û ew ji Honkongê revî û di serpêhatiya xwe,di rojnameke Êngilîzî de nivîsiye:Em hemî xistibûn xestexanekê (nexwaşxwanekêe)û di nav me de rajêrên her dewletê hebûn,fermandariya Japanî(emir kir) yan ferman derxist;ku herçî Talyan, Alman ,Îswîçî.portêgal û xelkên girava Filîpînê ne serbest bihêlin.
Ew dibêje:Ez çûm cem zabitê Japanî,ewî peya ji hev dibijartin û hin serbest dihêştin ,lê zabit gote min :Tu ji xelkê kû derê yî ?
Min got:Ez Filîpînî me .
Zabit dîsan pirsî :Tu li kû ji diya xwe bûye ?
Min got:li Holenda.
Zabit dîsan got:Holenda şerê me dike,divê tu herî (Qeregeha hêsîran) !
Filîpînî dîsan got:Yanê tu dixwazî min dîsan bişînî girtîgeha hêsîran ?
Lê li dawiyê; hêsîr zabit qanî kir (bawerkirin da) ,zabit wesîqe (belge) daye hêsîr û bi wî re got:Tuyê di nav bajêr de serbest bî,lê tu di bin nezaretê (çavdêriyê) de yî ,lê piştî demekê hêsîr xanîyekê ji xwe re li nik jinekê kirê dike û di pişt re ewî hevalên xwe yên Çînî dîtin û hevalên Çînî cilûbergên çînî jî li wî kirin û ew mîna hemwelatiyek Çînî dihate naskirin û bi vî rengî ew gihaye roja (6) Reşmehê cejna Çîniyan û di vê rojê de ew ji ber Japaniyan direve çiyan.
Lê di vir de jî gotarek din bi pênûsa H.Hişyar hatiye weşandin,ew dibêje: Divê rûpelên (Hawarê) ji xortên xwendevan re vekirî bin ta ku ew jî di warê hişmendiyê û rewşenbîriyê de pêşkevin û ew di gotarê de peyva Mîrê mezin bi bîrtîne û dinvîse:Mîr nivîsiye:Hawar kursiyê milet e, herkes nikane hilkişe ser û bêje .¬
Herdîsan di vir de Dilawer Çarpîne gotarekê bi navnîşana Stalîngrad dinivîse,ew di vir de dide diyarkirin ku çawa Alman ji bajarên dagirkirî dîsan xwe vedikşîne , gotarnivîs di vir de pesnê leşgerên Sovyetistanê dide û ew dibêje: Ji ber ku leşgerên Sovyetistanê qehreman in,leşgerên Alman bi mehan di vî bajarî de bûn,lê leşgerên Sovyetistanê bi mêranî ew ji bajêr derxistin û bajarê xwe ji wan rizgar kirin.



Di vê hejmarê de dîsan nivîskarê naskirî Hesen Şiyar dinvîse û ew raste- raste bang li Kurdan û nemaze li xortan dike û dibêje:Gelê Kurdan, divê hûn van peyvên min li her civakê ji ap û pismamên xwe re bixwînin da ku ew ji temarê(xewa kûr) hişyar bibin. Hej. (12).
Dîsan Şiyar Hesen gotareke din balkêş bi navnîşana (Bangê Kurdan) diweşîne,ew di vir de dinivîse:Gelê Kurdan ,nemaze xortên xwendevan, ez ji we hêvî dikim,hûn vê nivîsa min li her derê û li her civatê ji ap û pismamên xwe re bixwînin da ku ew ji xewa temar hişyar bibin û ew hîn dibêje:Xweda ji tevaya însên re mêjî dane, serî ji bo heş e, çav ji bo dîtinê ye, guh ji bo bihîstinê ye, dev ji bo bersivê ye, dest ji bo xebat,şer û parastina giyanê xwe û nijad e …….)Ew hîn berdewam dike û gotinên xwe arastî miletê xwe dike û dibêje:Em ne kêmî tukesî ne,lê çima em bindest in, jar û paşdamayênê her nijadê ne,em bindestiya hev qebûl nakin ,xebat û havilên hev napesinin,arîkariya hav nakin .
Kekino,birano, apino!Çavên xwe vekin û li dinyayê binêrin di riya welat û nijad de,li nik xelkê mirin çawan erzan e…, û ew dîsan bi vê wateyê dibêje: Eger em hînî tîp û xwendina zimanê xwe nebin, ma ev ne şerm e ! Herweha jî nivîskar di vir de gilûgazinên xwe ji gelê Kurd dike û dinivîse:Hûn rojnamên biyaniyan bi buhatirîn nirx dikirin, lê hûn rojname û kovarên me bi nirxên erzan nakirin !!! Hej.(13).
Herdîsan hin gotarên curbicur û bi hin pênûsên nasdar,1- Boketî heqê min e.2- Madanê ko ji ava behrê derket (Smaîlê Serhedê), 3- Alman di çi halî de ne (Xelîlê Genco).4 Sehên zozanan (Qedrî Can) . 5-Di nav mirovên însanxwar de (Hesenê Mistê).6 Civata bêdeng (Hesen Hişyar), û hin din.
Xelîlê Genco di vê hejmarê de gotarekê bi navnîşana (Aleman di çi halî de ne?) wek halê di sala 1918 an de ye) diweşîne,ew di vir de bi kurtî wisa dibêje:Vê paşiyê yekî biyanî ji ber lepên Alemanan xwe xelas kiriye (rizgarkirîye) û ew hatiye Londinê,ewî çi tiştên ku li Berlînê û li bajarên din li Almaniya dîtine ji rojnamevanên Londinê re qise dike û li gor ew dibêje: Piraniya Almanan ji zefereke tekuz û qehar re nema bawer dikin,
lê ew hîn diêjin ku Hitlir wê bikare Almaniya bighîne silheke maqûl, yanê Hitlêr wê bikane Almaniya ji talûka Belşevîkan û ji hin din xelas bike, lewra menewiyata Almanan hetanî îro jî qenc dikare bête hesêb .
Ew zilama hîn dibêje:Alman dibêjin:Hemî qewetên Almaniya di keleha Ewropayê de bêne hesbandin, ew keleha nayê zeptkirin …..,Ûrus wê bizanin ku di xizmeta Anglosaksonan de bi tenê ew in ku şer dikin û xwîna xwe ji bona wan dirêjînin,lewra jî ewê xwîna xwe ji bona wan dirêjînin, lewra jî ewê êrişa xwe bisekînin û nema qesta Rojavayê dikin, Anglosaksonan naxwazin Rusiyeke muzefer bibînin ji ber ku ew jî bi taluka sor hesiyane û ji van gotinan dixuye ku Alman hîn umîda zeferê wind nekirine,ew bawer dikin ku bi lihevhatinekê bi Ûrus yan bi Anglosaksonan re,ewê bikanibin xwe ji perîşaniyê xelas bikin,rewşa Almanan mîna sala 1918 an xerap bû, lê li dawiyê gotarê nivîskar dibêje:Hitler nema kane vî şerî bibe serî .

Dûmahîk heye Efrîn. 2023

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola kovara (Ronahî) di pêşketina çand û çapemeniya Kurdî de

Di xeleka yekê de, me navnîşanên gotarên cuda yên pênûsên cuda pêşkêşî xwendevanên lêkolînê kiribûn, lê emê di vê xeleka duhem de bi kurtasî li ser naverokên hin gotarên kovarê jî rawestin û baweriyên xwe di ser têdayên wan de jî bi kurtebirî bidin diyarkirin.
Sernivîserê kovarê kurtegotarek di hejmara (1) ê de li ser Êlîzabêt weşandiye ; ew di wir de bi van wateyan dinivîse: Êlîzabêt bi hevjînê xwe re li rex gelê xwe ji bo destxistina azadiya welêt û kişwera xwe radiweste,ewa bi hemû şêweyan û li her cîhekî û li her civînekê amede dibe û têkoşînê dike, ewa bi erkên xwe yên niştimanperwerî mîna her nişteciyekî radibe.

Em bawer dikin ku Mîr Celadet Bedirxan bi zanîneke bilind helwesta Êlîzabêt û hevaltiya wê bi hevjînê xwe re dinivîse û ew bi vî şêweyî nameke taybet ji jin û mêrên Kurdan re dişîne û waneyekê ji civaknasiyê dide wan û nirxa jina pêşketî ji civaka Kurdî re dide nasîn .
Lê sernivîser di hejmara sisiyan de mijarekê di bin navnîşana (şer mêranî û camêrî ye) diweşîne ; ew di wir de dibêje:Di şer de mêranî şertê (mercê pêşin e),belê mêranî di her tiştî de qenc e û di her tişî de bi kêr têt.
Lê gava dijmin ji desthilatê ket û teslîm bû (xwe radest kir) êdî li wî xistin ne mêranî ye, lê ew bêbextî ye.
Di vir de sernivîser nerasterast bi xwendevanên kovara xwe re dibêje:Divê miletên bê mafên netewî bindest nemînin ,di vê rewşê de berxwedan û pêdarî bi mêranî pêwîst in.
Di hejmara çaran de,sernivîser gotarekê bi navnîşana(Ev kî ye ?) diweşîne, ew di wir de dibêje: Kalemêrekî (57) salî dixwîne? Lê kî ye ev kalemêra eyan ew Qeral e? Eyan ew Impirator e,serekdewlet e, yan ew qehremanek e ?Na ! Ew ne yek ji van hemûyan e, ew şagirtekî dibistanê ye,ew ji Londinê ye,navê wî Albêrt Arthur Lewis e, ew dewlemend e û niha ew li zanîngehê xwendekar e,Celadet bi Kurdan re dibêje:Ey Kurdno! Ji kalo îbretê bigrin!
Dîsan Celadet gotarekê bi navnîşanê (Erefat) di hejmara (5) an de dinivîse:Hesen Axa seredana min li Şamê dike û ew ji min dipirse,gelo hejmara nû ya kovara (Hawarê) derçûye ?
Celadet ji wî dipirse,gelo kes li Cezîrê (Hawarê) dixwîne ?
Hesen Axa dibêje:Belê, pir kes wê dixwînin û ew gotara bi navnîşana (Erefat) bi nav dike û dibêje:Ez pir dixwînim û ez herdem li (Hawarê) dipirsim, gelo ewa derçûye yan na?Erefat navê kesekî cotarî ye dajo, ew di ber cotê xwe re kovara (Hawarê) jî dixwîne,li dawiyê Celadet di gotara xwe de bang li kesên Kurd; Axan û Began dike ku ew zimanê xwe bixwînin.
Di hejmara (6)an de gotarek bi navnîşana (jin û derew) bê diyarkirina navê nivîskar hatiye weşandin,lê li gor texmîna me, gotarnivîs dîsan Celadet Bedirxan bi xwe ye.

Gotarnivîs weha destpêkiriye:Metelokek japanî gotiye:(Hecî zane baxive,derewan dike). Ji lewra jî divêt mêr jî derewan bikin û ew hîn jî dinivîse:Kurmancan jî gotine:(Ji weynên jinan çiyayê Cudî xwar bûye).
Ew hîn dinivîse:Di wextê berê de tiştine holê ji xwenda û zana dipirsîn,lê îro van tiştan ji artîstên sînemayê dipirsin ji ber ku ew rind dizanin maç bikin, qey ew di her tiştî de şehreza ne,îcar ew rabûn û ji artîsteke sînemayê Bolît Godard pirsîn:Ma çima jin viran dikin? Artîstê gotiye: Carekê Çarlî Çeplen ev ji artîstekî sînemayê, lê yekî nêr ji min pirsî bû,ma hûn jin çire derewan li me dikin,hîngê min lê vegerand û got ji ber ku hûn mêr derewan li me dikin, eger em derewan dikin, ew ne socê me ye ,mêr bi xwe me bêgav dihêlin ku em derewan bikin .
Dîsan di vir de gotarnivîs nimûnek berçavkirî ji xwendevanên xwe re dinivîse:(cejna jinekê ye,mêrê wê ji wê re çentak destan aniye,lê berê li nik jinikê sê çenteyên din mîna wê hene, mêrik ji jina xwe dipirse:Kêfa te ji vê diyariyê re hatiye?Jinik weha dibersivîne: Min ji xweda hêvî dikir ku çentak welê(wisa) têkeve destên min). Gotarnivîs ji xwe û ji xwêneran dipirse, dêmek ewa çawa rastiyê ji mêrê xwe re bêje û dilê mêrê xwe ji xwe bihêle!!???.
Li dawiyê em dibêjin ev pirsgirêkek civak û derûnasî ye, gengeşe li ser naveroka vê mijarê dikane di pir aliyan de bibe, gotarnivîsê me tiliyên xwe datîne ser diyardeyek pir hestewar û dikane bi wê hest û hişên xwendevanên xwe di warê civak û derûnasiyê de bileqîne .
Divê em vê rastiyê jî berçav bikin ku Celadet Bedirxan di vê gotara xwe de nêrîna xwe ya taybet li ser derewên jinan û mêran ne daye xûyakirin .
Ez bawer dikim ku her lêkolînerek û yan her xwendevanê vê gotarê wê dilxweş bûya, eger Mîrê me,wek rojnamevan,têkoşer û zimanzanê mezin nêrînên xwe jî bi zelalî li ser vê pirsgirêka derûnî bida xûyakirin û bi ya me be,tunebûna nirîna nivîskar di vê diyardeya jorîn de lekek rojnamevanî û zanistî ye .

Herweha jî rojnamevan Celadet Bedirxan di hejmara (7) an de gotarekê bi navnîşana (Germanistan bi yar û neyarên xwe) dinivîse: Ordiwên Alman di qadên şerê Urus de nemaze di Stalîngradê de ketine delavne teng û ji milê din jî serkarên Nazî di hundirê welêt û di piştê eniyê de bi dijwartinene mezin pev diçin .

Rûpel 13

Dûmahî : Panorama sala 2023an - Girîngtirîn bûyerên li Kurdistan û Cîhanê

7'ê Tîrmehê, Rûsyayê li dijî vegera serokên "Tabûra Azurfestal" bi serokê Ukrayna Zelensky re ji Tirkiyeyê protesto kir.

11'ê Tîrmehê li Lîtvanyayê civîna NATO'yê pêk hat.

17'ê Tîrmehê pêleke mezin a germahiyê li rojava û başûrê DYA'yê rû da û li Koreya Başûr jî helî rabû ku di encamê de bi kêmanî 37 kes mirin.

17'ê Tîrmehê Rûsyayê ragihand ku lihevkirina hinardekirina dexlê Ukraynayê rawestandiye.

18'ê Tîrmehê Erdogan çû Erebistana Siûdî, peymanên razemenî û parastinê îmze kirin.

26'ê Tîrmehê li Nîjerê derbeyek li dijî serok Mihemed Bazûm hat kirin.

30'ê Tîrmehê li Eyn El Hilwa ya li Lubnanê ji ber şer, fermandarekî leşkerî jî di nav de, 6 filistînî hatin kuştin.

31'ê Tîrmehê serokê banka Lubnanê Riyad Selama piştî 30 salan ji erkê dûr ket.

3'yê Tebaxê derbekarên li Nîjerê peymanên leşkerî yên li gel Fransayê betal kirin.

6'ê Tebaxê Mihemed Tekale li şûna Xalid El Muşrî bû serokê Meclisa Bilind a Dewletê ya Lîbyayê.

7'ê Tebaxê zêdetirî 3 hezar leşkerên DYA'yê gihaştin Rojhilata Navîn.

22'yê Tebaxê Koma BRICS civînek li Afrîkaya Başûr li dar xist.

23'yê Tebaxê rêveberê hêzên Wagner ê Rûsyayê Yevgeny Prigozhin di encama ketina balafira wî de mir.

5'ê Îlonê balyozê Erebistana Siûdî yê li Tehranê dest bi kar kir.

11'ê Îlonê avakirina projeya korîdora aborî ya nû ya di navbera Hindistan, Kendav û Ewropayê de hat ragihandin.

14'ê Îlonê Erebistana Siûdî ji bo dan û standinên aştiyê li Riyadê bang li şandeyeke Hûsiyan kir.

18'ê Îlonê DYA û Îranê di çarçoveya pevguhertina dîlgirtiyan de 5 girtî berdan.

24'ê Îlonê serokkomarê Fransayê ragihand ku heta dawiya salê dê hêzên Fransayê ji Nîjerê vekişin.

28'ê Îlonê Komara Qerebaxê ragihand ku dê heta dawiya salê were betalkirin.

3'yê Cotmehê Ermenistanê tevlêbûna Dadgeha Ceza ya Navneteweyî erê kir.

7'ê Cotmehê şer di navbera Îsraîl û Hemasê dest pê kir.

8'ê Cotmehê Îsraîlê ragihad ku bi fermî ketiye rewşeke şer.

10'ê Cotmehê bi dirûşma "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêk Kurd re çareseriya siyasî" pêngavekê li ser asta cîhanê dest pê kir.

11'ê Cotmehê serokkomarê Îranê û welîehdê Erebistana Siûdî şerê Hemas û Îsraîlê nîqaş kir.

11'ê Cotmehê li Îsraîlê avakirina "hikumeta awarte" hat ragihandin.

16'ê Cotmehê Washingtonê biryar da ku ji bo mîsogeriya ewlehiya Îsraîlê 2 keştiyên barhilgirên balafiran li Rojhilata Navîn bi cih bike.

17'ê Cotmehê Konseya Ewlehiyê ya NY'yê di sepandina pêşnûmeya Rûsyayê ya "agirbesta mirovî" li Xezayê de bi bin ket.

14'ê Cotmehê bidawîbûna endamtiya serokê parlamentoya Iraqê Mihemed Helbûsî hat ragihandin.

19'ê Mijdarê Hûsiyan keştiyeke Îsraîlê revand.

24'ê Mijdarê ji bo Îsraîl û Hemasê agirbesta mirovî hat ragihand.

28'ê Mijdarê serdana serokkomarê Îranê bo Tirkiyeyê hat taloqkirin.

30'yê Mijdarê Kongreya Avhewayê li Dubeyê dest pê kir.

1'ê Kanûnê agirbesta di navbera Îsraîl û Hemasê de bi dawî bû.

6'ê Kanûnê sekreterê giştî yê NY'yê Antonio Guteress ji bo hişyarkirina ji xetereyên şerê li Xezayê yekem car madeya 66'an bi kar anî.

6'ê Kanûnê serokê Rûsyayê Pûtîn serdana Îmarat û Erebistana Siûdî kir.

8'ê Kanûnê DYA'yê veto li hemberî pêşnûmeya meclisa bilind a bi daxwaza "agirbesta mirovî' li Xezayê bi kar anî.

11'ê Kanûnê NY'yê hişyarî da ku sala 2024'an di warê mirovî de "saleke tarî" be.

Rojnameya Pêşverû Dengê Rastiyê ye
Em li benda gotar , nerîn , pêşinyar û rexneyên we ne

Panorama sala 2023an - Girîngtirîn bûyerên li Kurdistan û Cîhanê

Di sala 2023'yan de bûyer, guhertinên siyasî, leşkerî û xwezayî rû dan. Hinek hêzên herêmî û navneteweyî nêzî hev bûn, lê ji Ukraynayê heta Sûdan û Xezayê şer û alozî zêdetir bûn. Li hinek welatan jî ji ber karesatên xwezayî wekî erdhej, lehî û bahozan aloziyên mirovî zêde bûn.

Bandorên şerê li Ukraynayê û nakokiya di navbera rojava û Rûsyayê de dewam dikin. Şerê li Xezayê alozî û nakokiyên li Rojhilata Navîn û cîhanê zêdetir kirin. Her wiha li gelek welatan karesatên xwezayî rû dan û nêzîkbûna di navbera hêzên siyasî de bandoreke erênî li rewşa gel nekir.

Em ê di vê dosyayê de bûyerên girîng ên di sala 2023'yan de li ser asta cîhanê rû dane, parve bikin.

1'ê Çileyê Luiz Inacio Lula da Silva ji bo cara sêyem wekî serokê Brezîlyayê hat destnîşankirin.

8'ê Çileyê li Til Evîvê îsraîlî li dijî Netanyahu û hikumeta wî xwepêşandan li dar xistin.

12'yê Çileyê Neteweyên Yekbûyî (NY) 8 salên dawîn wekî salên herî germ nirxandin.

18'ê Çileyê wezîrê karên derve yê Ukraynayê jî di nav de, bi kêmanî 17 kes ji ber ketina helîkopterekê li nêzî Kîevê mirin.

5'ê Sibatê di encama şewata li daristanên Şîliyê de bi kêmanî 23 kes mirin. Serokê Şîliyê "rewşa bobelatê" ragihand.

6'ê Sibatê, li Dîlokê bi pileya 7.8 û li bajarê Mereş a Bakurê Kurdistanê erdhej çêbû. Erdhejê bandor li deverên cuda yên Sûriyeyê jî kir. Di encamê de zêdetir 50 hezar kes bûne qurbanî û derdora 12 hezar avahî li Tirkiyeyê û Bakurê Kurdistanê hilweşiyan.

17'ê Sibatê li Lubnanê xwepêşandêran bankek şewitand.

7'ê Adarê wezîrê parastinê yê DYA'yê serdana Iraqê kir.

10'ê Adarê Erebistana Siûdî û Îranê li ser ji nû ve domandina têkiliyên dîplomatîk li hev kir.

15'ê Adarê nirxê pereyê Lubnanê bi awayekî mezin daket, her dolarek bû sed hezar lîre.

17'ê Adarê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî biryara girtinê li dijî Pûtîn da.

18'ê Adarê piştî 10 salan, wezîrê karên derve yê Tirkiyeyê serdana Qahîreyê kir.

Di 20'ê Adarê de, Hûsiyan ragihand ku piştî dan û standinên bi nûnerên hikumetê re, wan bi hikumeta Yemenê re lihevkirinek pêk aniye ku 181 girtiyên xwe, bi berdêla 706 girtiyan serbest berdin.

20'ê Adarê pisporên navneteweyî hişyarî da ku ji ber bandora mirovan germahiya gerdûnî 1,5 pileyî zêde bibe.

22'yê Adarê ji ber kêmbûna avê hişyariya aloziyeke cîhanî hat dayîn.

25'ê Adarê Dadgeha Navneteweyî biryara ku bêyî erêkirina hikumeta Iraqê nabe kamyonên petrolê ji Başûrê Kurdistanê ji Bendera Ceyhanê ya Tirkiyeyê derkevin.

27'ê Adarê parlamentoya Iraqê pêşnûmeya qanûna hilbijartinê parlamentoyê û xwecih erê kir.

4'ê Nîsanê Fînlandiya bi fermî tev li NATO'yê bû.

5'ê Nîsanê Îranê balyozê xwe li Îmaratê erkdar kir.

7'ê Nîsanê dewleta Tirk a dagirker bi dronekê êrişî balafirgeha navneteweyî ya li Silêmaniyê kir.

15'ê Nîsanê şer di navbera artêşa Sûdanê û Hêzên Piştevaniya Lezgîn de dest pê kir.

18'ê Nîsanê hêzên ewlehiya Tûnisê baregehên Partiya Nehdayê girtin û serokê partiyê Raşid El Xenûşî destgîr kir.

3'yê Gulanê li Kremlînê li dijî serokê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn hewla kuştinê hat kirin.

14'ê Gulanê li Tirkiyeyê dengdana ji bo hilbijartinên serokkomariyê û parlamentoyê dest pê kir.

19'ê Gulanê piştî ku hikumeta Şamê li Komkara Erebî hat vegerandin, lûtkeya 32'yan a komkarê hat lidarxistin.

28'ê Gulanê Komîsyona Bilind a Hilbijartinan a Tirkiyeyê ragihand ku Recep Tayyîp Erdogan careke din bû serokkomarê Tirkiyeyê.

6'ê Hezîranê Îranê careke din balyozxaneya li Erebistana Siûdî vekir.

3'yê Tîrmehê hêzên Îsraîlê êrişî bajarê Cenîn kir.

4'ê Tîrmehê Enqere û Qahîreyê ragihand ku dê asta têkiliyên diplomatîk bi pêş bixin.

Rûpel 15

Komên çekdar li kalemêr û pîrejineke kurd dixin

Di /7/1/2024an de li gundê Memala yê ser bi bajarokê Reco - Herêma Efrînê, çekdarên nandoz ên erebên nîştecihkirî êriş birin ser mala welatiyê kurd (Hemîd Mistefa) û bi awayekî hovane li wî û hevjîna wî xistin û bi giranî birîndar kirin.
Di vê derbarê de jêdereke taybet ji me re ragihand ku : Ew komên nandoz ji çekdarên Sultan Murad in. Piştî ku bi awayekî hovane li wan xistine zêr û pereyên wan jî jê standine.
Li gorî agahiyên wê jêderê: Ev ne bûyera yekê ye ku wisa çêdibe mixabin rewşa Herêma Efrînê rojane wisa ye.

Danhev : Pêşverû

Li Efrînê çeteyan dest bi revandina malbatan kirine

Çeteyên artêşa Turk a dagirker li navenda bajarê Efrînê malbatek revand. Li Efrînê ku ji aliyê artêşa Turk û çeteyên wê ve hatiye dagirkirin, sûcên revandin û guhertina demografiyê bê navber dewam dikin. Çavkaniyan da zanîn ku çeteyên dewleta Turk a dagirker di roja Yekem a sala nû de malbatek ji mala wan revand. Çeteyan jina bi navê Ferîda Îbrahîm , hevjînê wê Delîl Hebeş û 2 zarokên wan ji mala wan a li nêzî Çerxerêya Neworz a li navenda bajarê Efrînê (ku navê kirine Çerxerêya Selahedîn) revandin û birin cihekî nediyar.
Ferîda Hebeş a 27 salî ji gundê Meydan Ikbis, hevjînê wê Delîl Hebeş ê 32 salî jî ji navçeya Raco ye.

Li Mabeta zeviyên Zêtûnan bûne çêrgeha Nîştedagîran

Milîsên îslamî yên dagîrkeriya Tirkiyê zevî û milkên Bizor ji xakdûrxistiyên (Penaber) Efrînê li navçeya Mabeta bi diravan didine Nîştedagîrên Ereb û Tirkman ên şivan.
Di vê çaroçvê de jêderin herêmî li navçeya Mabeta ragihand ku milîsên îslamî (Artêşa El-Nuxbe) yên dagîrkeriya Tirkiyê hêrên (zevî) Zêtûnan ên neajotî li deşta gundê Amara bi diravan didin şivanên xwe yên ku weke Nîştedagîr li Efrînê bi cih bûne, di encama vê kiryarê de pezên Nîştedagîran ziyanên mezin û giran dane darên Zêtûnan.
Herwisa wê jêderê destnîşan kir ku berî demekê heman îslamîstan (Artêşa Azad, Artêşa Nîştimanî, El-Nusra) yên opozîsiyona Sûrî ku dûvçilkiya dagîrkeriya Tirkiyê dikin zeviyên Efrîniyan li deşta gundê Amara desteser kiribûn û ji xwe re Nok û Nîsk lê çandine.

Dûmahî : Rapora qirkirina Kurdên Efrînê

Di rewşeke din de çeteya Ceyş El-Şerqiye êşkence li sivîlekî Kurd kiriye li Cindirêsê, tenê ji ber ku wî doza xaniyê xwe ji çeteyan kir. Endamên heman koma çete, 20´ê Adara 2023´yan di Newrozê de ji ber ku agirekî piçûk pêxistin, çar endamên wê malbatê qetil kirin.

Enqere dixwaze ev sûc bên kirin

Rapor dibêje, ev sûc li temamê Efrînê belav in, tevî bangên rêxistinên serbixwe yên navneteweyî û yên Net-eweyên Yekbûyî (NY) yên ji bo bi dawîkirina wan jî di nava pênc salan de ti gav nayê avêtin û vê yekê weke "nîşaneke din a îhtîmala mezin a ku Enqerê destûreke bêsînor daye van komên çekdar da ku van sûcan bikin" şirove dike.
Encama sereke ya raporê jî mirov dikare ji hevoka li jêr bigire: "Komên çekdar ên ser bi ANS´ê [komên çete yên dagirker vî navî li xwe dikin] bi awayekî belav û sîstematîk mafan binpê dikin, di nava binpêkirin û sûcan de kuştina mirovan, girtina kêfî, bi darê zorê wendakirin, êşkencekirin, miameleya xirab, talan, desteserkirina milkan, tepeserkirina sivîlên Kurd da ku mal û milkên xwe bi cih bihêlin, astengkirina vegera wan a li bajarên wan, Tirkkirin û guhertina demografiyê hene."
Ji bo ku agahiyên şahidan bide piştraskirin, STJ, agahî bi rêya dîmen û wêne ji çavkaniyên li Efrînê û wêneyên ji satelîtan hatine girtin, dane piştrastkirin. Ji sedî 25´ê şahidan Êzîdî ne û ji 6 kesên êşkence li wan hatiye kirin jî 2 Êzîdî ne. Di nava wan de kal û pîr jî hene. Di amadekirina raporê de rêxistinên weke Minority Right Group International, PÊL (Civile Waves), Lêlûn, Synergy hevdestî û Norad jî cihê xwe girtine. Belgeyên hatina amadekirin dikarin weke delîl û belge di rewşa dadgeheke li dijî dagirkeran û ji ber sûcên şer bên bikaranîn.

JÊDER : NAVENDA NÛÇEYAN

Rapora qirkirina Kurdên Efrînê

STJ bi rapora xwe ya li ser sûcên dagirkerên Turk û çeteyên wan ên li Efrînê raporeke berfereh li ser desteserkirina milk, girtin û revandina xelkê Efrînê amade kir: Ev rapor belgeyeke ji bo siyaseta qirkirina Kurdan li Efrînê.

Rêxistina Syrians for Truth and Justice (STJ) raporeke berfereh li ser zilm û neheqiya li Kurd û Êzîdiyên li Efrînê mayî, hazir kir. Rapor bi sernavê "Five Years of Injustice are Enough!" (Pênc salên neheqiyê bes in!) derçû, xwe disipêre 40 hevpeyvînên di navbera Adar û Gulana 2023´yan hatine kirin. Rapor nîşan dide ka qirkirina Kurdan û Kurdên Êzîdî çawa li Efrînê bê navber 5 salan dewam kiriye. Rêxistin, xasma bi çarenûs û serpêhatiya mexdûrên erdhejê yên ji deverê re peyiviye da ku vê raporê amade bike.
Rapor bi awayekî eşkere nîşan dide ku komên çete yên dagirker ên cihê yên ser bi hêza dagirker a dewleta Tirk ve, hemû vê zilm û zorê li xelkê Efrînê dikin. Bi her halê komên çeteyên herî zêde vê zilmê bi rêxistin dikin, û navên wan weke êşkencekar û zalim tê hildan jî evên li jêr in: Lîwa El-Hemza, Lîwa Sultan Murad, Feyleq El-Şam, El-Jebhe el-Şamiye, Ceyş El-Şerqiye, Ehrar El-Şerqiya, Ceyş El-Nuxba-Beşê Bakur, Çeteya Nûr El-Dîn El-Zengî, çeteyên bi navê Polêsê Leşkerî û Rêxistina Istîxbarata Tirk (MÎT).
Di encama raporê de pirr eşkere xuya dibe ku dagirker du tohmetan weke îdîa bi kar tînin da ku bikin hincet ji bo Kurdên Efrînê bigirin, êşkencê li wan bikin, milkên wan desteser bikin û nehêlin biçin ser milkê xwe bikevin malê xwe:
* Hevkariya bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re
* Endametiya PKK´ê.

Zilm li hevkarên xwe jî kirin

Di encama raporê de derdikeve holê ku dagirker ne tenê kesên bi Rêveberiya Xweser re xebitîne, dike armanca van êrişên xwe yên li dijî mirovahiyê; lewma gava Kurd bin, ew dijber û muxalifên Rêveberiya Xweser jî bin, dagirker wan digirin, direvînin, êşkencê li wan dikin û milkên wan desteser dikin.
Li aliyê din derket holê ku dagirkeran êşkence bi awayekî sîstematîk bi kar aniye da ku bikin xelk îfadeyê li ser xizmên xwe û cîranên xwe bidin.
Piştî erdheja 6´ê Sibatê jî avahiyên xisar li wan bû, hatin hilweşandin û cihê wan îro rût hatiye hiştin. Xwediyê wan malan îro ditirsin ku mafê wan ên milk bi temamî û daîmî ji dest wan bên standin.
Di raporê de wekî din xuya dibe ku nexasim jî erdên civaka Êzîdî bi awayekî komî ji dest wan tên girtin û milkên wan tên desteserkirin. Dagirkeran gelek mal, dikan û erdên zeytûnan ên Êzîdiyên Efrînê desteser kirine. Ji raporê weke nimûne mirov dikare behsa koma çete El-Cebhe El-Şamiye bike ku li ser temamê gundê Baflûnê ê navçe Şaranê desthilat e.
Xelkê gund ji Syrian for Truth and Justice re gotiye, koma çete vegera malê ya temamê xelkê gund asteng kiriye û li malên wan Erebên ji deverên din ên Sûrî û malbatên koma çete bi cih kirine.
Rapor nîşan dide ku bi pereyên ji milkên desteserkirî tên bidestxistin, ji bo çalakiyên çeteyan û dagirkeran ên li deverê tên bikaranîn. Wekî din di nava 40 hevpeyvînan de yek jê li ser xaniyekî ye ku dagirkerên çete ew desteser kirine û veguherandina cihê "rêxistineke civaka sivîl" a ser bi dewleta Tirk.

Belgeya revandina ji bo fîdyeyê

Rapor nîşan dide ku komên çete yên ser bi dewleta Tirk ên ku navê "Artêşa Nîştimanî ya Sûrî" (ANS) li xwe dikin, bi giştî xelkê direvînin û êşkenceyê li wan dikin da ku fîdyeyê ji wan bistînin. Di nava 40 kesan de yên ku hevpeyvîn bi wan re hatiye kirin, jineke Êzîdî û kalemêrek jî hene. Wan kalemêr revandiye, êşkence lê kiriye û fîdye ji xizmên wî standiye. Herçî jina Êzîdî ye, êşkence lê hatiye kirin û cezayekî giran ê hepsê lê hatiye birrîn. Mexdûrekî din êşkenceyê jî behsa wê yekê dike ku li Ezazê li navendeke dagirkeran a girtina xelkê, wî dîtiye dest avêtine gelek kesan û kesên li wê navenda girtinê jî ser bi MÎT´a Tirk bûne.

Şirketa anonîm a êşkencekar û dagirkeran

Şahidiyên mexdûran ên di raporê de nîşan didin ku dagirker û komên çete yên dagirker bê îstîsna sûcên li dijî mirovahiyê li dijî xelkê efrînê kirine. Jineke mexdûr, di şahidiya xwe de dibêje, çeteya El-Hemza ew du sal û nîvan revand û wenda kir, haya xizmên wê ji aqûbeta wê nebû, hevjînê wê li hepseke dagirkerên çete şehîd bûye û çeteya Suqûr El-Şam jî xanî û milkê wan desteser kiriye.

Rûpel 17

Daxuyanî ji civîna Yekem a Komîta Navendî ya Partiya Pêşverû

Di dîroka / 13 / 12 / 2023an de komîta navendî ya ku ji kongirê Şazdemîn a "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" hatiye hilbijartin civîna xwe ya Yekem li darxist.
Civîn di heyameke hevaltî û bi berpirsiyariyeke bilind karnameya karê xwe gotûbêj kir û ev xal li xwe girtin :
- Pêşindana biryarên kongir û gotobêjkirina wê di pêşketin û pêşxistina karê rêxistinî di hundir desteyên partîzanî de , û li gor resenên rêxistinî û pirensîbên dîmoqratî yên ku tizûka navxweyî û biryarên kongir pesend kirine.
Herwiha tekezî li ser regezên lêpirsînê hate kirin ji bo parastina partiyê ji diyardeyên neyênî yên ziyanê dighînin rêxistinê û rewabûna partîzanî.
- Gotûbêjkirina mîkanizmên sazkirina nivîsgeh û desteyên partîzanî di nav komîta navendî de li gor pêşhat û pêşketinên vê demê.
- Hilbijartina sekreterê partiyê û cîgirê wî li gor tizûka navxweyî ya ku kongirê Şazdemîn pesend kiriye.
Di vê çarçewê de mezintirîn endamê komîta navendî ya partiya me heval Umer Cefer serokatiya civînê kir û civîn bi rêve bir , di destpêka gotina xwe de xêrhatina hevalan û pîrozbahiya wan kir ku baweriya kongir standin ji serkirdayetya partiyê re.
Piştre gotûbêjeke dirêj di derbarê mîkanizmên karê rêxistinî de hate kirin ji bo pêşxistina xebata partîzanî li gor pêşhat û pêşketinên di vê qûnaxê de da ku karibe li hember astengiyên ku li hember gelê me û tevgera wî ya rêzanî raweste , herwiha civîn li ser belavkirina karûbarên di nav komîta navendî de rawestiya , û tekez kir ku kar were kirin wek giropek yekbûyî bo cîbicîkirina pirensîbên karê pirjimarî di nav desteyên partiyê de..
Di vê civînê de endamên komîta navendî regeza hilbijartina sekreterê partiyê û cîgirê wî pêşinyar kirin lê xebatkarê cefakêş hevalê dilsoz Mamoste Ehmed Silêman û bi hesteke bilind ji berpirsiyariyê û bi giyanekî hevalane dest da heval Ehmed Berekat û got : Diktor Ehmed Berekat sekreterê partiya me ye û ez jî cîgirê wî me , ev helwesta dilêr û hişmend ji mamoste Ehmed Silêman bû ciyê serbilindî , rêzgirtin û kêfxweşiya hemû hevalên endamên komîta navendî.
Di dawiyê de civînê biryar da ku komîta navendî karên xwe berdewam bike di sazkirina nivîsgehên xwe de li gor tizûka navxweyî.

13 / 12 / 2023 Z - 2635 K

Komîta Navendî ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Pîrozbahiya KNKê ji Kongireya Partiya Pêşverû re (P.D.P.K.S)

Rêzdarên hêja!
Em gelek spasîyên xwe bo dawetnama ku beşdarî kongreya we ya şazdemîn bibin dikin. Gelekî mixabin derfetên ku em beşdarî kongreyê bibin nîne. Em bi hêvînin ku hûnê vê peyama me ya pîrozbayê qebûl bikin.
Rêzdarên hêja
Kongreya we di demeke gelekî hesas û nazik de pêk tê. Gelê me hêvîyeke mezin ya yekrêzîyê û yekîtîya neteweyî ji me hemîyan dikin, dakû em karibin parastina berjewendîyên neteweyî misoger bikin. Misogerî di pêkanîna yekrêzîyê û di sengerên tekoşîna li dijî dagerkerîye pêk tê. Em çendîn yekrêzîya xwe xurt bikin serkeftina me jî ewqas nêzîktir dibe.
Em bi hêvîne ku kongreya we jibo xurtkirina yekîtîyê û yekrêzîya gelê me encamekî baş derxîne holê û serkeftinê ji kongreya we re dixwazin.
Silav û rêzên xwe bo hemû beşdarvanan pêşkêş dikin.

Konseya Rêvebir ya KNKê

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (75) Çile 2024Z - 2636K

Dengê Pêşverû

Şeş sal di ser Dagîrkirina Herêma Efrînê re

Di roja 20 / 1 / 2018an de , Di demjimêr Sisê û sêzdeh xulekan de berî bi şeş salan balafirên cengî yên dagîrkerên Turk êrişî navenda bajarê Efrînê kirin , piştre her şeş navçe Bilbilê , Reco , şera , şiyê , Cindirêsê , Mabeta top-baran kirin. Herwiha hêzên dagîrkeriya Turk û nandozên artêşa nîştimanî ya Sûrî bi hemû çekên xwe yên giran bajarê Efrînê dagîrkirin di encamê de bi sedan pakrewan û bi deh hez-aran ji gelê me koçber bûn ji ber tpobarankirina bejayî û ezmanî bi ser herêmê de.
Piştî şeş salan ji dagîrkeriyê heya niha herêma Efrînê rastî tawan û binpêkirinan tê , çekdarên îslamî di dermafê welatiyên kurd de di kiryarên xwe yên ne mirovî de berdewamin ji talan , dizî , û destdirêjahiya li ser samanên wan , her-wiha girtin , revandin û kuştinê li dijî wan bi kar tînin bi aramanca xizankirin û perîşan kirina welatiyên kurd da ku ew neçar bibin ku dest ji gund û bajarê xwe berdin û koçberiyeke firehtir di nav kurdan de were kirin û guherîna dîmixrafî li herêma Efrînê pêk bînin.
Siyasetên ku dewleta Turkiyê dimeşîne ew siyaseteke pilankiriye ji bo tunekirina gelê kurd û berdewamiya pilanên wê ye ji dagîrkeriya xaka Sûrî re.
Em di Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê de vê bêtar û felaketê bi xemgîniyeke mezin di dermafê êş û azarên gelê xwe de bi bîrtînin , herwiha em wan cangoriyên ku di ber xak û rûmeta gelê xwe de canê xwe dane silav dikin û bi bîra xwe tînin , û van siyasetên Turk û Erebkirinê ya ku dewleta Turkiyê li herêmê dimeşîne em şermezar dikin.
Di heman demê de em bang li civaka nav-dewletî , deste û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin , û fişarê li ser Turkiyê bikin da ku dagîrkeriya xwe li herêmê bi dawî bîne , û peydakirina heyamek erênî û parastinek pêwîst ji bo vegera gelê kurd li Efrînê.

20 / 1 / 2024 Z - 2636 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Pîrozbahiyek ji Rêxistina Efrînê de

Pîrozname

Hevalê hêja Diktor Ehmed Berekat
Hevalê hêja Mamoste Ehmed Silêman
Hevalên hêja endamên komîta navendî ya partiya me
Silav li we hemûyan
Di destpêkê de em keda we û keda hemû heval û xebatkarên partiya me di serkeftina kongirê me yê Şazdemîn de bilind dinirxînin , û bi vê babeta giranbuha em di Rêxistina Efrînê de ya "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" germtirîn silav û pîrozbahiyan arasteyî we dikin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin.
Hevalên xebatkar
Kongira partiya me di rewşeke hestiyar de li darket ku Sûri-yê bi tevahî û herêmên kurdî bi taybetî di rewşeke dijwar re derbas dibe lewre ji her demê zêdetir lêvegereke gîştî ji siyaset , helwest û mîkanizmên xebata Tevgera Rêzaniya Kurdî re tê xwestin û divê "Navenda Biryara Rêzanî ya Kurdî li Sûriyê" were avakirin da ku karibe li hember astengiyên ku li Sûriyê û herêmên kurdî hene raweste. Careke din em kongireya Şazdemîn li we û tevahî gelê xwe pîroz dikin û serkeftinê ji xebata serkirdayetiya me ya nû re dixwazin.

5 / 1/ 2024 Z - 2636 K

Rêxistina Efrînê ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Kela Horî we silav dike

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين